
Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Gişтî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

Hejmar (529)
2026-11-06

www.agirimedia.org



DI VÊ HEJMARÊ DE:

Rojev 7
Hevpeyvîn 8
Civakî 10
Mafê Mirov 11
Poster..... 12

Heta kengî em ê stûxwar û bêdeng bimînin?



Em dixebitin, di avakirina welêt de xwedî par bin û mîna welatiyên din, em xwedî maf û nasnama neteweyî a xwe bin. çima divê ji bo bidestxistina mafên neteweyî yên xwe, em tim daxwazkar bin? Em naxwazin kesên din ji mafên xwe bêpar bibin, em tenê dixwazin ji nasnameya xwe xwedî derkevin û qedera me dest me xwe de be.

Em dixwazin ku pirsa Kurd bi rêyên aştiyane û bi diyalogê bê çareserkirin, mafên hemû kesan bên parastin û kes ji ber nasnameya xwe ji neyê girtin û kuştin.

Weke Kurdek, ez nikarim li hemberî êşa gelê xwe bêdeng bimînim. Em mafdar in ku bi serbilindî bijîn, em mafdar in ku bi zimanê xwe bixwînin, bi çanda xwe bijîn û pêşeroja zarokên xwe bê tirs ava bikin, evane jî hemî di demekê de misoger dibin ku em bi xwe qedera xwe diyarî bikin, neyînku em blindest bin û desthilat û netewa baladest û rêjîma dagîrker bixwazin wan mafan weke sedeqe û xêr bo me bibînin û ev bo me diyarî bikin ku heta di nava wan de asmîle û êntîgire bibin.

Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bi dehan sale bo çêkirina Kiyan û qeware û serweriya neteweyî xebat kiriye û nirxên giran jî di vê rêkê de dane, bê guman heya geheştina bi wan armancan jî dê xebat û berxwedan berdewam bike

Heta kengî em ê bêdeng bin? Heta kengî divê em li benda xêr û sedeqê bin? Îro ji heçî demê zêdetir me pêdivî bi hişyarbûn û hevgirtinê heye. Divê em rê nedin ku ti kes û aliyekê ku miamilê li ser qedera me bikin, lewra berî her tiştî dive weke rastiyekê em hem mijara hişmendiya netewî ku bi keyfxweşî ve li gupka pêşketinê de ye biparêzin, hem jî rastiyan digel gelê xwe bas bikin ku hem aliyê ku bi xeyala xwe li ser mafê gel miamilê li gel dagîrker dike, binasînin û vê perdê bidirînin ku xelk jî ruçkê wan bibîne.

Gelê me hişyar e û her tiştî fêm dike, lê ya çavnihêriya wan, helwest û nêrîna partiya wan, anku Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ye, çimku vê Hizbêy a xwe û ji xwîn û goştê xwe dizanin.

Gelo ma koştina Kurdan yê dibe çand?



Mijara vê rûpelê derbarê metirsiya asayîbûna tundûtûjiyê, pirsgirêka ewlehiyê û asimilasyona çandî ya bi rêya kuştina Kurdan di nav civaka Kurdistanê de û li hember bêdengiya sîstematîk a rejîmên desthilatdar û civaka navneteweyî disekine. Ji aliyê N. Serbest Urmiye ve hatiye nivîsandin.

RUPELA 4

Ji bo nanê malbatê: Karkerên Kurd ên Rojhilatê Kurdistanê li welatên derdorê



Mijara vê rûpelê derbarê koçberiya karkerên Kurd ên Rojhilatê Kurdistanê ya ber bi welatên derdorê ve, pirsgirêka kolberiyê, xizaniyê û bêpariya aborî ya sîstematîk a li herêmê di bin desthilatdariya Komara Îslamî ya Îranê de disekine. Ji aliyê N. Azad Kurdî ve hatiye nivîsandin.

RUPELA 3

Rojilatê kurdistanê layîqê rêz û qîmetê ye



Mijara vê rûpelê derbarê rexnekirina dîplomasiya Herêma Kurdistanê ya li hember kurdên Rojhilatê Kurdistanê, peywendiyên bi Komara Îslamî ya Îranê re û bangawaziya ji bo nîşandana empatî û piştgiriyê ji bo Rojhilatiyan disekine. Ji aliyê N. Nûrî Aldur ve hatiye nivîsandin.

RUPELA 9

Hizba Dêmokrat û siyaseta realist



N. Omer Balekî

Demek e ku, basek li ser çemka «Entegrasyona Dêmokratîk» wekî çareseriya pirsa Kurd li Rojhilatê Kurdistanê hatiye rojevê û di navbera alîgir û neyaran de nîqaşek mezin çêkiriye. Ez şîrovekirina wê têgînê bi du sedeman pêwîst nabînim: Ya yekem, pirsa neteweyî bi têgîna «entegrasyonê» re bi temamî ji hev cuda ye, ya duyem, kesên pispor di wê babetê de bi qasî pêwîst li ser naveroka wê têgînê axivîne. Di heman demê de hemû kes û aliyek azad e ku nêrîna xwe li ser tevahiya pirsên taybet bi civakê re bîne ziman û parêzgariyê li nêrîna xwe bike. Lê dema anîna ber basa babetekê û hewldana ji bo çespandina wê, ziyanê bigihîne civakê, wê demê derbirîna wê nêrînê nakeve çarçoveya azadiya derbirînê.

Di rewşa îroyîn de ku cîhan û bi taybetî navçeya Rojhilata Navîn wekî mencela ser agir dikele û guhertinên mezin li navçê û nava Îranê de bi rê ve diçin, xistina xistine ber basa babetekî wekî «entegrasyonê» bi paşgira dêmokratîk ve bi armanca çareserkirina pirsa Kurd, ne tenê alîkar nabe ji bo pêşveçûna wê pirsê û çareseriya wê, belkî bi dehan gavan wê li paş ve vegerîne.

Tiştê ku li vir pêwîst e şirovekirin li ser bê kirin ev e ku alîgirên «entegrasyonê» ji bo parvekirin û parastina nêrîna xwe, hewl didin bi anîna belgeyên curbecur li ser gotinên rêberên şehîd, dîrok û siyasetên Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bixin bin pirsyarê û «entegrasyonê» bêxne nava raya gelê Kurd û bêjin: Ew e pêştir armanca Hizba Dêmokrat jî bûye bo çareseriya pirsa Kurd heman «entegrasyona dêmokratîk» di nava Îranê de bûye! Bê guman ew kes û aliyên ku wan pirsan dikin, yan dîrok, bername û helwestên siyasî yên Hizba Dêmokrat nexwendine, yan di rastiyê de ew hewldana wan ji bo veşartina têkçûna wan e li qada têkoşînê ji bo bidestxistina mafên neteweyî yên neteweya Kurd.

Bi gotineke din, em dikarin bibêjin nimûne nîşandan bi Hizba Dêmokrat ji aliyê alîgirên «entegrasyona dêmokratîk» ve ji vir tê ku ew bingehê rastîn ê gelêrî yê Hizba Dêmokrat li Rojhilatê Kurdistanê dizanin, di heman demê de agahdar in ku Hizba Dêmokrat wekî partiya herî bi temen a Kurdî ku heta niha ji rêbaza neteweyî ya xwe derneketiye û di her çar parçeyên Kurdistanê de cihê rêzê û nîşana têkoşîn û berxwedanê ye, lewma hewl didin bi mifahwergirtina pêgeha rêberên Hizbê, rewayetiyê bidin projeyekê ku nikare pirsa neteweyî ne tenê li Îranê, belkî li beşên din ên Kurdistanê jî çareser bike.

Ew babeteke sepandî ye ku pirsa Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê pirseke neteweyî ye û bi temamî cuda ye ji pirsa têkelbûna bi civakeke din re yan heman «entegrasyonê». Ji ber ku neteweya Kurd bi dirêjahiya dîrokê li ser wê axê jiyaye ku Kurdistan e. Li gor pênaseyên navneteweyî, Kurd netewe ye ji ber ku li ser axa xwe dijî û xwediyê ziman, dîrok û çandeke serbixwe ya xwe ye. Lewma divê em bînin bîra xwe ku têkoşîna neteweya Kurd di dema sed salên derbasbûyî de ji bo wê nebûye ku di nava netewe û civakeke din de bê «entegrekirin», belkî ji bo wê bûye ku bibe xwediyê serweriya xwe û karibe biryarê li ser çarenûsa siyasî ya xwe bide û wekî neteweyeke cuda pênase ji bo wê bê kirin.

Hizba Dêmokrat li ser destê Pêşewa Qazî Mihemed hat damezrandin û bi rêberiya Dr. Qasimlo bû xwediyê pêkhateyeke partiyeke modêrn û 81 sal e pêşengê têkoşîneke xwînavî ye ji bo bidestxistina mafê neteweyî yên neteweya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê. Lê ji destpêka avabûna Hizba Dêmokrat ve, rêberên wê Hizbê li ser wê bingehê meşiyane ku di siyasetê de realîst bin û ew mîratek e ji Pêşewa Qazî Mihemed ve maye.

Realîzm bi wê manayê ye ku rêberên siyasî yên partiyekê aşina bin bi şiyana leşkerî, malî û piştevaniya gelêrî ya dost û dijminên xwe, di heman demê de şiyanên partî û neteweya xwe jî di hemû waran de bizanin, wê demê ew rêberitî dikare bibe xwediyê siyaseteke serketî. Dema ku Hizba Dêmokrat hat damezrandin, Kurdistan demek bû ku di navbera çar dewletên «Eraq, Tirkiye, Sûriye û Îranê» de hatibû dabeşkirin û Kurd li ser axa xwe ji mafên neteweyî bêpar mabûn, tewî çêbûna dewlet-neteweyan li wan welatan, hewldana desthilatdaran ew bû ku ziman, dîrok û çanda neteweya Kurd di nava neteweya serdest de bihelînin. Lê bi damezrandina



Hizba Dêmokrat, ragihandina Komara Kurdistanê û çêbûna nîşanên neteweyî, pêşî li rêka helandina neteweya Kurd di nava neteweya serdest de hat girtin.

Em dikarin bibêjin damezrandina Hizba Dêmokrat piştevaniyeke mezin bû ji bo geşebûna zêdetir a hesta neteweyî di nava civaka kurdewarî de û aşinabûna zêdetir a takê Kurd bi mafên xwe. Lewma ger em li dîroka Hizba Dêmokrat binêrin, em bi wê rastiyê re rû bi rû dibin ku rêberên wê Hizbê ji destpêkê ve hewl dane rastiyên cîhana siyaseta navneteweyî û navçeyî li ber çavan bigirin û li gor wê daxwazên xwe formûle bikin.

Felsefeya damezrandina Hizba Dêmokrat li ser bingehên Komeleya J.Kaf, têkoşîn û xebat e ji bo bidestxistina mafên neteweyî yên neteweya Kurd.

Her ji roja ewil ve bingehê mafê diyarkirina çarenûsê ji bo Hizba Dêmokrat yek ji wan prensîban bûye ku hertim wekî eslekî neguherî di bernameya xwe de parêzgarî li ser kiriye. Lê mafê diyarkirina çarenûsê têgeheke berfireh e û şêwazên cûrbecûr dixe nava xwe wekî: «Xudmuxtarî, federalîzm, konfederalîzm û serxwebûn».

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê wekî partiyeke berpirs li hember tevgera mafxwaz a xelkê Kurdistanê û wekî partiyeke realîst, bi berçavgirtina rewşa siyasî û erdnîgariyê ya Îranê û navçeyê di qonaxên cûda de hewl daye rêkareke nû bigire ber.

Demek ku tevgera rizgarîxwaz di nava neteweyên Îranê de hîn pêşve neçûbû, Hizba Dêmokrat şêwaza Xudmuxtariyê pêşniyar kiribû, lê dema ku bloka sosyalîst hilweşiya û hesta neteweyî ya neteweyên pêkhatên wê blokê careke din serî hilda û bi dehan dewlet li ser bingehê neteweyî hatin naskirin, di heman demê de li nava Îranê jî hêdî hêdî dengê nerazîbûna neteweyan li dijî Komara Îslamî bilind bû û rêxistin û aliyên neteweyên Îranê bi nihênî û aşkere dest bi têkoşînê kirin, Hizba Dêmokrat gihîşt wê baweriyê ku federalîzm pergala desthilatdariya herî guncaw e ji bo Îrana pêşerojê û kir dirûşma xwe ya stratejîk.

Li gor wê, Hizba Dêmokrat piştî ew qas xwîn û qurbaniyê ne tenê di armancên neteweyî de paşvekêşî nekiriye, belkî li gor guhertinên nava Îranê gekekî jî çûye pêş. Ew jî bi wê manayê ye ku rewş û qonaxa têkoşînê di her serdemekê de helwest û siyaseta xwe ya guncaw dixwaze, bêyî ku destberdarê armanca sereke bibe.

Di dawiyê de hewce ye em bînin bîra xwe ku li Îranê bêyî cîgîrbûna pergaleke dêmokratîk û federal, mafê neteweya Kurd û neteweyên din ên pêkhatî nayê bidestxistin, bi heman awayî jî, bêyî dabînkirina mafên neteweyî yên Kurd û neteweyên din, ti pergaleke dêmokratîk li Îranê ser nagire û pêk nayê.

Ji bo nanê malbatê: Karkerên Kurd ên Rojhilatê Kurdistanê li welatên derdorê



N. Azad Kurdî



Dîtina hin wêneyan û dîmenên jiyana dijwar a karkerên Kurd ên Rojhilatê Kurdistanê li welatên derdorê, wijdana her mirovê xwedî hest û mirovahiyê dihejîne. Ew karkerên ku ji ber siyaseta cudakarî û paşxistina aborî ya rejîma Îranê, di bin zexta şert û mercên dijwar ên jiyanê de neçar dibin bi mehan ji malbatên xwe dûr bimînin û li welatên derdorê bixebitin, tenê ji bo ku karibin debara jiyana malbatên xwe bikin.

Ji sala 1979'an vir ve, Rojhilatê Kurdistanê herdem rastî dorpêçên siyasî û aborî, cudakarî û paşxistina birêkûpêk a rejîma Îranê hatiye. Di vê demê de, kêmtirîn sermaye û budce ji bo pêşxistina binesaziya aborî û xizmetên giştî yên vê herêmê hatiye terxankirin. Ev yek jî bûye sedem ku derfetên kar, pêşkeftin û jiyaneke bi rêz ji gelek niştecihên Kurdistanê bêpar bimînin.

Îran ji aliyê dabeşkirina dahat û derfetên aborî ve welatek e ku cudahiyên berbiçav di navbera netew û herêmên pêkhatî yên wî de hene. Siyaset û awayê dabeşkirina budceya dewletê li herêmên cuda ne wekhev e. Herêmên Kurdistan, Belûçistan, Loristan û Ehwazê ji wan deveran in ku bi rêjeyên bilind ên bêkariyê, xizaniyê û kêmbûna xizmetên giştî re rû bi rû ne. Li gorî gelek rapor û daneyên aborî, van herêman di nav deverên herî paşxistî yên Îranê de cih girtiye.

Ev rewş di demekê de ye ku Îran yek ji welatên dewlemend ên cîhanê ye di warê çavkaniyên xwezayî û binerdî de. Petrol, gaz, zêr û gelek kanzayên din ên girîng di axa vî welatî de hene. Lê belê, tevî van çavkaniyên mezin, di nêzîkî nîv sedsala desthilatdariya Komara Îslamî ya Îranê de, rewşa aborî û jiyana xelkê ne tenê baş nebûye, belkî her ku dem derbas dibe dijwartir dibe. Ev yek bi taybetî li herêmên kêm pêşketî û paşxistî yên wek Kurdistan, Belûçistan û Ehwazê baştir xuya dike.

Dahata mezin a ku ji firotina petrol û gazê tê bidestxistin, ne bi awayekî wekhev û dadperwerane ji bo pêşxistina hemû herêmên welêt tê bikaranîn. Pêwîstiya gel bi nexweşxane, dibistan, rê, av, elektrîk, derfetên kar û xizmetên bingehîn ên din heye. Lê li gelek deverên Kurdistanê, ev xizmet hîn jî di asteke pir kêmtir de ne li gorî hin bajarên navendî yên Îranê. Ev cudahî pirsên girîng derbarê awayê dabeşkirina budceya dewletê û siyaseta pêşxistinê ya rejîmê derdixe holê.

Ji ber vê rewşa xirab a aborî û nebûna derfetên kar li Rojhilatê Kurdistanê, di van salên dawî de hejmareke berçav ji karkerên Kurd neçar bûne ku ji bo dabînkirina debara malbatên xwe biçin welatên derdorê û li wir bixebitin. Gelek ji wan bi mehan ji zarok, jin û malbatên xwe dûr dimînin. Ew di şert û mercên pir dijwar de dixebitin, di cihên nebaş de dimînin û ji bo destkevtina mûçeyeke biçûk gelek zehmetiyan dikişînin.

Dîmen û wêneyên ku rojane di torên civakî de tên belavkirin, rastiya jiyana van karkeran nîşan didin: şert û mercên dijwar ên kar, xwarin û vexwarina kêm, cihên nebaş ên razanê û mûçeyên ku carinan heta ji bo pêdiviyên bingehîn ên jiyanê jî bes nakin. Ev rewş ne tenê pirsgirêkeke aborî ye; di heman demê de pirsgirêkeke mirovî û civakî ye. Dûrbûna ji malbatê, bêparbûna ji mafên bingehîn ên karkeriyê û nebûna ewlehiyê bandoreke kûr li ser jiyana wan û malbatên wan dihêle.

Pirs ev e: Berpirsyariya vê rewşê li ser milê kê ye? Çawa welatek ku xwediyê van çavkaniyên mezin ên xwezayî ye, nikare derfetên jiyaneke bi rêz ji bo hemû welatiyên xwe peyda bike? Dahata petrol û gazê ku bi milyaran dolar tê bidestxistin, li ku derê tê mesrefkirin? Çima ev dahat ji bo pêşxistina herêmên xizan û dabînkirina xizmetên giştî nayê bikaranîn? Kê li hember vê rewşê berpirsiyar e?

Ev pirs tenê pirsên karkeran nînin; pirsên hemû welatiyên Îranê ne. Bersiva wan jî divê di dabeşkirina budceyê, rêvebirina aboriyê û siyaseta giştî ya dewletê de bê lêgerîn.

Li gorî raporên hin rojnamevan û çavdêrên serbixwe yên aborî li Îranê, beşeke girîng a dahata welêt di nav torên aborî yên girêdayî karbidestên bilind ên rejîmê, malbatên wan û saziyên dewletê de tê kontrolkirin û bikaranîn. Herwiha, beşeke mezin a aboriya Îranê di bin kontrola Sipaha Pasdaran de ye. Ev yek pirsên cidî derbarê şefafiyetê, kontrola aborî û bikaranîna dahata neteweyî ji bo berjewendiya giştî derdixe holê.

Ji aliyekî din ve, beşek ji budceya dewletê ji bo bernameyên leşkerî û ewlehiyê, wekî bernameyên etomî, mûşekî û çêkirina dronan, tê terxankirin. Herwiha, rola Îranê di piştgiriya hin komên çekdar ên herêmê de jî bûye mijara nîqaş û rexneyên navneteweyî. Ev siyasetan bandorên xwe li ser pêwendiyên derve yên Îranê û rewşa ewlehiyê ya herêmê dikin. Di encamê de, alîkariya leşkerî ya derve û bernameyên leşkerî jî dibin mijara nîqaşê, dema ku di hundirê welêt de gelek malbat bi xizantî û kêmbûna derfetên jiyanê re rû bi rû ne.

Herwiha, li Rojhilatê Kurdistanê bi salan e ku hejmareke mezin ji welatiyên Kurd ên niştecihên deverên sînorî, ji ber nebûna kar û derfetên aborî, ji bo dabînkirina pêdiviyên jiyana malbatên xwe neçar dibin karê kolberiyê û kasibkariyê bikin. Ev kar di şert û mercên pir metirsîdar de tê kirin. Roj tune ku nûçeya kuştin, birîndarbûn an girtina çend kolberan neyê belavkirin.

Kolberî ji bo gelek malbatên li herêmên sînorî ne hilbijartineke dilxwaz e, lê rêyek e ku ji ber bêkariyê û nebûna derfetên din ên jiyanê neçar dimînin wê hilbijêrin. Kolber di rêyên çiyayî, di nav berf û bahozê de, di şev û rojê de, bi xetera gulebaran, mayîna di berfê de, ketina ji çiyan û mayîna li bin barên giran re rû bi rû ne. Di gelek bûyeran de, hêzên sînorî yên Îranê li dijî wan çek bikar tînin û dibin sedema kuştin û birîndarbûna wan.

Ev rewş nîşan dide ku bêkariyê û nebûna derfetên aborî çawa dikare mirov bixe rewşeke ku jiyana xwe bike nav xeterê, tenê ji bo ku debara malbata xwe bike. Kolber ne sûcdar in; ew karkerên ku ji bo mafê jiyanê û mafê xebatê têdikoşin. Pêwîstiya wan bi ewlehî, mafên karkeriyê û derfetên kar ên bi rêz heye, ne bi gule û zext.

Ev her tişt tenê beşek biçûk e ji rastiya jiyana gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê di bin desthilatdariya Komara Îslamî ya Îranê de. Li pişt her wêneyekê çîroka malbateke heye; li pişt her karkerê ku ji welatê xwe dûr dikeve, çavên dayikekê, hevjînekê û zarokên ku li benda vegera wî ne hene. Li pişt her kolberekî jî malbateke heye ku debara wê girêdayî wê mûçeya biçûk e ku bi xetera canê xwe bidest tîne.

Bêguman, dema ku welatek xwediyê çavkaniyên mezin ên xwezayî be, lê welatiyên wî ji bo debara rojane neçar bimînin ji welatê xwe dûr bikevin, ev yek pirsên bingehîn derbarê rêvebirin, dadperwerî û mafên mirovan derdixe holê. Enflasyon, bêkariyê, kêmbûna hêza kirînê û zêdebûna nirxê tiştên bingehîn jiyana xelkê bi awayekî giran dijwar kiriye. Li gorî hin daneyên ku li navxweyê Îranê yên ne dewletî tên belavkirin, rêjeya enflasyonê jî gihîştiye astên pir bilind.

Mafê her welatiyekî ye ku li welatê xwe bi ewlehî, azadî û bi rêz bijî; kar hebe, dahateke bes bistîne û malbata xwe di şert û mercên mirovî de debara xwe bike. Karkerên Kurd ên Rojhilatê Kurdistanê jî ji vê mafê mirovî bêpar nînin. Pirsgirêka wan ne kêmbûna xebat û hewldanê ye, lê nebûna derfetên wekhev û şert û mercên dadperwerane ye.

Pêwîst e ku dengê van karkeran, kolberan û malbatên wan bê bihîstin. Ji bo ku her civakek bi dadperwerî û aramî bijî, divê mafê kar, jiyaneke bi rêz û derfetên wekhev ji bo hemû welatiyan were misoger kirin. Heta ku ev mafên bingehîn neyên dabînkirin, çîroka karkerên ku ji bo nanê malbatên xwe neçar in welat û malbatên xwe bihêlin, dê berdewam bike.

Gelo ma koştina Kurdan yê dibe çand?



N. Serbest Urmiye



Kuştina Nîma Zeynalî, ciwanekê Kurd ê ji Urmiyê, ji aliyê du kesên Azerîziman ve, her çend ev bûyer hewceyî lêkolîneke berfireh, zelal û bêalî ye, bûyereke din a tal e ku careke din bi dehan pirsiyarên bêbersiv ber bi rûyê civaka Kurdistanê dike. Pirsiyarên li dor parastina ewlehiya welatiyan, binasên netewexwaziya tundajû, berpirsiyariya dezgehên yasayî û metirsiya asayîbûna tundûtûjiyê .

Dema ku ciwanek li ser axa xwe tê kuştin, pirsa bingehîn eva ye, ka gelo civak û dezgehên berpirsiyar karîne wekî ku divê, mafê jiyanê û ewlehiya wî biparêzin? Gelo rastî dûr ji nasnameya neteweyî ya qurbanî û tawanbar dê eşkere bibe? Gelo dadperwerî bê ferq û cudahiya ziman û şûnasê bo hemûyan wekhev e?

Bi salan e ku siya bêdengiya sîstematîk ya rejîmên dagirker û civaka navneteweyî li hember ferq û cudahîyê nasnameya neteweyî, xizanî, ewlehî û tundûtûjiyê de Kurdistan dagirtiye.

Bi terzekê ku meydan ji ber dubarebûna tundûtûjiyê di Kurdistanê de berfirehtir kiriye û bûye sedema belavbûna bêzarî, nefret û bêbaweriyê di navbera komên civakî de.

Ev bêdengiya sîstematîk û nebûn û paşguhxistina dadperweriyê, wekî du aliyên devê kêrê ne, ji aliyekî ve civakê bêbandor dikin û bi bêdengiyê tê de dikin adet, ji aliyê din ve jî ku aliyê tûjtir yê devê heman kêrê ye, biyavê ji bo serhildana hind tevger û komên tundajû amade dike ku çareseriyê ne di yasa û bêdengiyê de, belku di kiriyara hevreng de dibînin.

Ji ber ku sebebkar û sedemên kuştinên ser şeqaman, kuştin û komkujiyên dewletan li seranserê Kurdistanê ji Îlamê ve heta Kobanê, Efrîn, Amed û Kerkûkê heta niha bêyî çareseriya dadperwerane û dûr ji bersiva zelal a yasayê di goleke şêlû de mane, zirarek wiha mezin û bêveger li bawerî û hizra gîştî ya Kurdistanê hatiye dan ku metirsiya bûyerên nexwestî tê te heye.

Ev yek jî bûye sedema zêdebûna hesta nebûna ewlehiyê û lêdana Zenga hişyarbûnê ku weke xwe dikare civaka westiyayî ji tundûtûjiyê ber bi bizavên tolhildanê ve bibe, berpirsiyariya vê rewşê jî bi eşkere dikeve ser milê hikûmetên dagîrker û civaka navneteweyî ya ku bêdengî kiriye pêşe.

Pirsgirêka sereke mezintir e û ji kiryara take kesî derbas dibe, di wir de rêkxistinên siyasî û civakî ne ku hewla ji nû ve serhildan û domandina tundûtûjiyê didin.

Dema ku sîstemên siyasî û dezgehên ewlehiyê bi awayekî berfireh û sîstematîk agirê pirsên ziman, çand û netewexwaziya serberedayî, geştir dikin, rê ji bo asayîkirina tundûtûjiyê valatir dibe.

Metirsiya netewexwaziya serberedayî di vê rastiyê derdikeve: dema ku mirov ne ji ber nasnameya xwe ya take kesî, belku ji ber ziman û nasnameya neteweyî ya xwe tê hilsengandin û dadgehîkirin.

Di rewşeke wilo de, sûca take kesekî dibe hecet ji bo sûcdarkirina neteweyekê û qurbankirina mirovekê dibe alavek ji bo perwerdekirina nefret û dijmindariyê di hizra gîştî ya civakê de.

Rê nedin ku xwînrijandin bibe çand

Gelo kuştina Kurdan yê dibe çand? Bêguman mirov nikare tenê li ser bingeha dubarebûna çend bûyeran bigihîje encmanê, lê bi ji berçavgirtina bûyerên ku bi salan e li Kurdistanê de qewimîne û bêdengiya rejîmên desthilatdar û civaka navneteweyî li hember van bûyer û tundûtûjiyan de, dikare bi eşkere bê gotin ku tundûtûjî li van herêman bûye deb û edeteke asayî û ber bi aliyê serhildana çandekê ve de diçe.

Kuştinên wekî kuştina Nîma Zeynalî û tundûtûjiyên sivîl û dewlwtî yên ji aliyê dewlên hakim di Kurdistanê de ku li dijî xelkê sivîl, azadîxwazan û xwepêşanderên nerazî li siyasetên dagîrkar û newekhevperêz li hemû parçeyên Kurdistanê dimeşin, tenê sernivîsên rûpelên bûyerên hov û tawankariyê nînin, ew qîrînên pirsgirêkek bingehîntir in: mafê jiyanê, mafê azadiyên take kesî û civakî, mafê diyarkirina çarenûsê, parastina nasnameya neteweyî, zimanî û dabînbûna ewlehî û rûmeta mirovî.

Ev bûyer banga eşkerekirina rastiyan û berpirsiyarî û bersiveke tevalî ne, daxwaziyek ku heke bêbersiv bimîne, dê bibe sedema teqîna gola nefret û hêrsa gel, nemana baweriya gîştî û herwisa dibe derfetek ji bo bihêzbûna tevgerên tundajû. Bê dadperwerî û wekheviyê, tundûtûjî nahê sekinandin. Berevajî, di gereke nû û metirsîdartir de ji nû ve serhildide.



Kurdistanîbûn û Kurdistanî fikir kirin, Du rênîşanderên rast û durist bo xebatê



N. Hemîd Çepatî



Meseleya Kurdistanê di dirêjahiya dîrokê de, her tim di navbera her du devên meqesekê de, di bin fişarê de bûye: ji aliyekê ve tepeserî, ewlekirin û dagirkeriya berfireh ji aliyê desthilatdarên serdest ve, û ji aliyê din ve, duberekî, kêmkirina daxwazan û têketina bîrdoziyên biyanî bo nava civakê ji hundir ve.

Di rewşeke wiha de, derbasbûna ji xebateke tenê hestiyar ber bi eqlaniyeteke rizgarker, hewceyî danîna rêbazeke hizrî ya ron e.

Gotina «Kurdistanîbûn û Kurdistanî fikir kirin»ê, ji têgihîştineke hestiyar zêdetir, ew manifêsto û rênîşandera stratejîk e ku dikare di tengavtirîn qonaxan de rê bide xebatên sivîl, siyasî û medyayî, da ku civak di rûbirûbûna xeterên derdorê de rêya xwe winda neke.

Kurdistanîbûn, vegera li ser hebûna miletê me ye, neteweyek ku cografya, ziman, çand û tevahiya xîmên jiyana wê ya civakî di bin dagirkeriyê de ne.

Ev aliyê vê gotinê, girêdana xebatê bi reh û rîşan e, da ku civak di rûbirûbûna projeyên dijwar ên dagirkeran de ji zordariya eşkere û leşkerî bigire heta koçberkirina xelkê û paqijkirinên berfireh tûşî windakirina xwe nebe.

Kurdistanîbûn vê têgihîştinê dide çalakvanê sivîl, siyasetmedar û rojnamevanan ku êş û armancên vî xakî, ji bakur heta başûr û ji rojhilat heta rojava, ji hev nayên cudakirin û berxwedan ne bijardeyeke demkî, belku şertê sereke yê mana li ser pêyan e.

Ev reseniya nasnameyê nahêle mirovê Kurd rewşa heyî ya ferzkirî wekî qedera xwe ya dîrokî qebûl bike, lê wî neçar dike ku hertim bîne bîra xwe ku rehên wî di vê axê de ne û girêdayî vê cografyayê ye.

Lê heke Kurdistanîbûn nîşana reseniya nasnameyê be, Kurdistanî fikir kirin nîşana eqlaniyeta stratejîk û şirovekirina hûr a hêzê ye. Dagirker tenê bi hêza leşkerî hukum nakin, ji şerê dijwar xetertir, şerê nerm, bindestîya çandî û endazyariya nasnameyê ye ku bi rêya berevajîkirina dîrokê, belavkirina xwe-kêmdîtinê û cihgirtina vê baweriya wêranker ku «Kurd nikarin xwe bi rê ve bibin» tê meşandin.

Armanca van projeyan teslîmkirina hişê civakê ye berî teslîmkirina laşê wê. Li kêleka van projeyên dijmin, xetereke din ku gelek caran xebatên neteweyî ji rê derxistiye, têketina bîrdoziyên hawirdekirî û derveyî neteweyî ye.

Hin tevger bi bilindkirina dirûşmên giştî, înternasyonalîstî yan berjewendiyên partiyan ên bê-têkilî bi rastiyên jeopolîtîk ên herêmê re, bêyî ku bixwazin meseleya Kurdistanê xistine rêzên dawî an jî ew kirine qurbana lîstikên hêzên herêmî.

Kurdistanî fikir kirin anku pîvana her teorî, partî û tevgerekê bi pîvaneke diyarkirî ev be ku bipirse, Gelo ev pêngav çiqas xizmeta berjewendiyên bilind ên Kurdistanê, rizgariya mirov û azadiya axa wê dike?

Yek ji telik an dafikên herî jîrane ku rejîmên serdest û tevgerên lihevkirî ji bo pûçkirina tevgerên neteweyî vedidin, kêmkirin û biçûkkirina daxwazan e.
Ew hewl didin meseleya Kurdistanê ji «meseleyeke neteweyî û desthilatdariyê» daxînin asta «meseleyeke xizmetguzarî, zimanî, kulturî yan reformxwazî di çarçoveya pergalên heyî de».

Hizra Kurdistanî bi awayekî ron diyar dike ku her çend ziman, cilûberg û çand xîmên pîroz ên nasnameya me bin, lê parastina wan bê piştgiriya «hêza siyasî û kiyana hikûmetî» ne mumkun e û lawaz e.

Zimanekî ku di bin îradeya hikûmeteke dagirker de destûr jê re were dayîn yan qedexekirin, her tim li ber tinebûnê ye û çand jî bê ewlekariya neteweyî û bê welatekî azad, mehkûmî helandinê ye.

Lewma mafên çandî, qonaxek in ji bo gihîştina mafê çarenûsî û desthilatdariyê û ne armanca dawî ne. Çalakvanê hişyar tu carî azadiya rastîn û desthilatdariya neteweyî bi îmtiyazên kêm, demkî û fermî yên çandî naguherîne.

Armanca dawî ya Kurdistanî fikir kirinê, parastina ramana dewleta Kurdistanê, serweriya neteweyî û kiyana siyasî ya serbixwe ye di bîra giştî de. Tu netewe bêyî xwedîderketina li çarçoveyeke siyasî ya serbixwe ku ewlehî, aborî, qanûn û çanda wê garantî bike, negihîştiye rûmet û azadiyeke mayînde.

Ev armanc divê ne tenê di civînên taybet de, lê belê di medya, wêjeya siyasî, perwerdehiya sivîl û dîplomasiya giştî de bibe çalakîyek berdewam, da ku civak tu carî tûşî asêbûna asoyê nebe yan bindestiyê wekî rastî nepijirîne.

Civaka ku xewna dewlet û serweriya xwe zindî bihêle, di tu tengaviyan de teslîmî îradeya biyaniyan nabe û nahêle çarenûsa wê li pişt deriyên girtî û ji aliyê kesên din ve were bazar kirin.

Di encamê de, Kurdistanîbûn û Kurdistanî fikirkirin destûreke kiryarî û rêbazek rojane ye ji bo jiyana siyasî, manifêstoyek e ku di qonaxên dîrokî de rê li ber biryarên lezgîn, îxaneta li berjewendiyên neteweyî an sergêjiyê di lîstika aloza hêzan de digire.

Ev hizir fêrî me dike ku berxwedana li hember projeyên dijwar û nerm ên dijmin, ne tenê bi çek an pênûsê, belku parastina xeta sor a serweriya neteweyî û tevgera rast û durist ber bi azadî û serxwebûna Kurdistanê ve pêk tê.

Rojnamevan, çalakvanê sivîl û siyasetmedarê Kurd, tenê wê demê dikarin erkê xwe yê dîrokî bi cih bînin ku van her du prensîban bikin rênîşandera domdar a pênûs, hizir û kiryara xwe.

Nûnasandina Têkoşîna Kurdî di Serdema Veguherînên Mezin de



N. Dr. Mehmûd Ebas

Beşa Dehem

Aloziya Ramana Ramyarî di Nav Tevgera Kurdistanî de

Aloziya tevgera Kurdistanî ya îro ne ji kêmbûna fedakariyan e, ne ji nebûna ezmûnê ye û ne jî ji lawaziya hesta neteweyî ye, van hemûyan di dîroka wê ya dirêj de bi hêz cih girtine. Aloziya kûrtir di wê de ye ku ramana ramyarî bi qasî mezinahiya vê dîrokê û bi qasî veguherînên berfireh ên ku cîhan û herêm hejandine, pêş neketiye. Tevgereke ku sed salan berxwedan li ser hev kom kiriye û gelek şêwazên tekoşînê ceribandine, hîn jî di gelek girêkên xwe de bi amûrên ramanî dimeşe ku bi qasî pêdivî nehatine gihandin da ku bikarin bersiva pirsên qonaxa nû bidin.

Veguherînên mezin dewlet û tevgerên ramyarî bi hev re neçar kirine ku stratejiyên xwe, hevalbendiyên xwe û têgihiştina xwe ji hêz, berjewendî û nasnameyê ji nû ve binirxînin. Ev yek tevgera Kurdistanî, ku di şertên zordestî, nasnekirin û pevçûnên dubare de derketiye holê, li ber pirseke çarenivîsê dihêle: Ew çawa dikare avahiya xwe ya ramanî ji nû ve binirxîne, bêyî ku bingehê nasname û armancên xwe winda bike?

Bi xwezayî bû ku rêxistinên Kurdî di nêzîkî sed salan de xwe li dora parastina hebûna neteweyî û parastina nasnameyê ji tunekirin û helandinê bicivînin. Lê gava tevger tenê di nav rêgeza parastinê de bimîne, û dîtineke ramyarî ku bikare dozê ji bersiveke li hember bûyeran veguhezîne projeyeke dîrokî ya hevgirtî ava neke, aloziya ramanî hêdî hêdî di hundirê wê de kom dibe, heta ku dibe yek ji girêkên herî girîng ên li ber pêşketina wê.

Heman şertên ku tevgera Kurdistanî neçar kirin giraniya xwe bide mayîn û parastina hebûnê, di gelek deman de ramana ramyarî jî kir peyrewê tekoşîna rojane. Giraniya sereke zêdetir li ser rêvebirina pevçûnê bi desthilatên serdest re, parastina rêxistinê û berxwedana li hember siyaseta nasnekirinê ma, ne li ser avakirina dîtinên gihîştî derbarê şêwaza dewletê, civakê, aboriyê û cihê Kurdan di hevsengiyên pêşerojê de.

Ji vir ve aloziya ramana ramyarî di nav partiyên Kurdistanî de derket pêş. Gelek ji wan, tevî dîroka dirêj û ezmûna dewlemend, hîn jî bi hişmendiya demeke borî dimeşin; li wir serkirdeyên dîrokî cihê navendî di diyarkirina rêçê de diparêzin, lê navendên ramanî û lêkolînê lawaz dimînin an bi temamî tune ne. Ji ber vê yekê, gelek caran axaftin li dora helwestên demkî, nakokiyên rêxistinî û hevalbendiyên rojane dizivirin, li şûna ku bigihîjin pirseke kûrtir: Projeya Kurdî di sedsala bîst û yekem de çi ye? Û tekoşîn çawa dikare ji rewşeke parastina domdar veguhere projeyeke ramyarî, çandî û aborî ku bikare pêşerojê ava bike?

Dabeşbûnên di nav meydana Kurdistanî de jî tenê pêşbaziya partiyan an tekoşîna li ser cih û desthilatê nînin; di kûrahiya xwe de nebûna bingeheke ramanî ya hevpar nîşan didin ku dikare zimanekî hevpar ê neteweyî li ser wê bê avakirin. Nakokiya di navbera rêçên Kurdî de ne tenê li ser taktîk û hevalbendiyan e; carinan heta têgihiştina projeya Kurdî bi xwe digihîje: Ma ew projeyeke neteweyî ye ku dixwaze naskirina di yasa bingehîn de, federalîzm an serxwebûnê bidest bixe? An projeyeke ramyarî ye ku dixwaze ji şêwaza kevneşopî ya dewleta neteweyî wêdetir here, wek ku hinek rêç di bin navên cuda de pêşniyar dikin?

Pirsgirêk ne di hebûna vê pirengiyê bi xwe de ye; tevgera ramyarî ya zindî nikare tenê yek reng be. Pirsgirêk gava dest pê dike ku cudahî bibe qutbûn, axaftin bibe hev sûcdarkirin, û pirrengî bibe dabeşbûnek ku nikare heta asta herî kêm jî dîtineke hevpar biafirîne. Wê demê partî êdî ne amûrên pêşxistina dozê dimînin, lê dibin giravên ramyarî yên girtî; her yek bi ziman, hesab û hevalbendiyên xwe, dema ku doza neteweyî di navbera projeyên ku tenê di dirûşman de digihîjin hev de daliqandî dimîne.

Li Rojavayê Kurdistanê, ku di salên dawî de ezmûneke ramyarî û rêveberî ya cuda derket holê, aloziya ramana ramyarî hêj eşkeretir xuya dike. Pirs



êdî ne tenê li ser rêveberî û ewlekariyê ye, belku li ser nasnameya projeyê bi xwe ye: Ma ew projeyeke neteweyî ya Kurdî ye ku dixwaze hebûna Kurdî di yasa bingehîn û erdnîgariyê de bicih bike? An projeyeke pirnasnameyî ye ku ji netewetîya kevneşopî wêdetir diçe? An şêwazeke tevlihev e ku hîn nekarî danasîneke zelal pêşkêş bike ku civaka Kurdî pê ewle bibe û doz ji helandinê biparêze?

Nebûna vê lêkolîna kûr kir ku gelek nakokî wek şerên partiyan an pêşbaziya li ser bandorê xuya bikin, dema ku di rastiyê de ew nîşana aloziyeke kûrtir in di dîtina pêşerojê de. Ya ku îro ji tengbûna erdnîgariyê, zexta tevlîbûnê bi Şamê re û paşveçûna hinek destkeftan derdikeve pêş, eşkere dike ku projeya ku xwe bi zelalî nade nasîn, dê hêzên din li gorî berjewendiyên xwe wê ji nû ve bidin nasîn.

Ji ber vê yekê, yek ji girîngtirîn pêdiviyên tevgera Kurdistanî îro vegerandina giraniya ramana ramyarî ye; ne wek ramaneke dûr ji rastiyê, lê wek yek ji bingehên mayîna projeyê bi xwe. Doza Kurdî ne pelgeyek rêveberî ya demkî ye; ew dozeke dîrokî ye ku pêdivî bi dîtineke demdirêj heye, dîtinek ku bikare mafê neteweya Kurd di erd û nasnameya xwe de bi xwendineke rast a tevliheviyên herêmî û navneteweyî re bigihîne hev.

Di vê çarçoveyê de, pêdiviya roleke firehtir ji bo rewşenbîr, lêkolîner û navendên ramanî di civaka Kurdî de derdikeve pêş. Tevgerên ramyarî ramana xwe bi xweber pêş naxin; pêdivî bi warê azad ê berhemanîna zanînê, vekolîna rastiyê û pêşxistina pirsên dijwar hene. Biryara ramyarî divê ne di nav hesabên teng ên partiyan û şertên demkî de girtî bimîne.

Ji vir ve, gavê pêdivî ev e ku ji rêgeza pevçûna hundirîn di navbera partiyan de derbasî rêgeza hevpeyvîna ramanî bibin. Ezmûnên mezin ên ramyarî tenê bi nakokiyên rêxistinî pêş neketine; ew bi lêpirsîn û ramanên nû pêş ketine ku dîtinên cuda li ser dewlet, civak, nasname û pêşerojê afirandine.

Aloziya ramana ramyarî di nav tevgera Kurdistanî de ne pêdivî ye ku nîşana lawaziyeke dawî be. Ew dikare nîşana qonaxeke veguhêz be ku pêdivî bi wêrekiya venêrînê heye. Tevgerên ku di nav veguherînên mezin re derbas dibin, dîtinên xwe yên nû bi hêsanî nafirînin; pêşî di nav demên bêaramî, pirs û venêrînê re derbas dibin, paşê xwe ji nû ve ava dikin.

Pirsa ku dê pêşeroja tevgera Kurdistanî di salên pêş de diyar bike ev e: Ma ew dikare ji tevgereke ku bi bingehîn xwe dispêre rêxistina ramyarî û leşkerî, veguhere tevgereke ku di heman demê de xwediyê projeyeke ramanî ya hevgirtî jî be; projeyek ku bikare cîhana nû bixwîne û cihê Kurdan di nav wê de ava bike?

Di cîhanekê de ku rêgezên ramyariyê bi lez diguherin, dibe ku ramana ramyarî bibe yek ji girîngtirîn amûrên hêzê yên gelan di rêya avakirina pêşerojeke baştir de.

Berdewam dike...

Nerîna Lîderan



“Mistefa Mewlûdî”:

“Şert û mercên ji bo hilweşandina Komara Îslamî, ji her demê zêdetir guncaw in.”



“benjamin netanyahu”:

“Îsraîl amadeyê êrîşkirin bo ser rêjîma Îranê ye lê li benda Donald Tiramp maye.”



“Donald Trump”:

“êrîşên bo ser rêjîma Îranê bi hewce binav kir ,hekî ev rewş dubare bibe ez dê her rêjîma Îranê bikim armanc.”



“May Sato”:

“Rêjîma Îranê ti rêyeke yasayî bi nîşandana nerizayetiyan nehiştiye”

Herêma Kurdistanê, Koşka aramiya Rojhilata Navîn û tirsa rêjîma Îranê ji vîna wê



N. Eskender Ceiferî



Rojhilata Navîn di dehsalên borî de hertim di nava hevkêşeyên jêopolîtîk ên aloz, qeyranên ewlehiyê û guhertinên stratêjîk de bûye. Di vê navberê de, Herêma Kurdistanê wekî yek ji histûnên sereke yên aramî, dêmokrasî û hevpêwendiya bi civaka cîhanî re, roleke girîng di hevsengiyên herêmî de dilîze. Geşedanên siyasî yên dawî, di nav de destpêkirina dubare ya rûniştinên Parlamena Kurdistanê, pêşwaziyên germ ên dîplomatîk ên ji aliyê welatên cîhanê yên cuda ve û pêdagiriya zilhêzan li ser giringiya vê herêmê, careke din nîşan dide ku statuya vê herêmê nayê înkarkirin. Lêbelê, jiyana siyasî û pêvajoya geşekirina demokrasiyê li Herêma Kurdistanê, hertim bi astengî, karxirabî û tirsa kûr a lîstikvanên ku hebûna xwe di înkarkirina nasname û vîna neteweyan de dibînin, rû bi rû maye; di seriya van lîstikvanan de rêjîma Îranê cih digire, ku hebûna Kurdistaneke bi hêz, ewle û aram wekî metirsiyeke rasterast li dijî bingeha xwe ya îdêolojîk dihesibîne.

Ji nû ve destpêkirina rûniştinên parlemanê, bihêzbûna dêmokrasiyê li Herêma Kurdistanê ye û vegerîna ser rêça qanûndanînê û çalakbûna nû ya parlamena vê herêmê bi dilê zilhêzan e. Bûyerek ku bi pêşwaziyeke berfireh û eşkere ya saziyên navnetewî û welatên cîhanê re rû bi rû ma. Yekîtiya Ewropayê bi weşandina daxuyaniyekê, ligel pêşwazîkirina li vê gava girîng, daxwaz kir ku kabîneyeke nû û berfireh di zûtirîn demê de li Herêma Kurdistanê bê avakirin da ku pêvajoya geşepêdan û aramiya navxweyî bi lezgînî bidome. Li gor dîtina Yekîtiya Ewropayê, xurtkirina saziyên dêmokratîk, lidarxistina hilbijartinên zelal û hebûna parlamentoyeke çalak, mafên welatiyan û geşepêdana berdewam in ku bi dilê zilhêzan e.

Di vê çarçoveyê de, civaka cîhanî jî bi çavekî erênî li van geşedanan dinêre. Ji bo mînak daxuyaniyên dîplomatîk ên welatên wekî Yonan û Srî Lankayê, çalakbûna dubare ya parlamena Kurdistanê, xuya dike ku wê wekî gaveke ber bi xurtkirina aramiyê ve dibînin û pêşwazî lê kirine. Ev piştgiriyên berfireh ên dîplomatîk nîşan didin ku Herêma Kurdistanê karîbûye xwe wekî hevparêke pabend bi nirxên dêmokratîk û aştîxwaz di asta navnetewî de bide naskirin. Bicihbûna saziyên sivîl û qanûnî yên xurt, mercên wiha dane vê herêmê ku hêzên herêmî û derveyî herêmê nikarin wê paşguh bikin.

Giringiya Herêma Kurdistanê tenê bi çarçoveya navxweyî ya Iraqê ve sînorkirî nîne, lê belê xwedî pîvanên berfireh ên jêopolîtîk e. Dewletên Yekbûyî yên Amêrîkayê gelek caran tekezî li ser piştgiriya xwe ji bo Herêma Kurdistaneke kiriye. Washington, Herêma Kurdistanê wekî hevpeymaneke stratêjîk û ewle di herêmeke tijî alozî û nearam de nas dike. Ev statuya stratêjîk, encama berxwedan, têkoşîna li dijî têrorê, parastina nirxên azadîxwazane û avakirina giravek aram û ewle li Kurdistanê ye.

Piştgiriya zilhêzan ji bo Herêma Kurdistanê, bi taybetî di warên ewlekarî, aborî û siyasî de, peyameke zelal ji bo neyarên vê herêmê ye. Ew jî ev e ku vîna Kurdan ji bo rêvebirin, pêşketin û geşepêdanê, beşek ji ewlehiya nû li Rojhilata Navîn e ku nabe bi gefên derdorê bê jinavbirin. Heger Herêma Kurdistanê bi hêz be, wekî mînakek ji jiyana hevbeş, serweriya qanûnê û geşepêdana aborî, mînakek ji bo beşên din ên navçeyê ye û ji ber vê yekê ye ku statuya wê, zêdetirî sînorên wê yên erdnîgarî giring e.

Li hemberî nêrîna civaka cîhanî û piştgiriyên Amêrîka û Ewropayê, rêjîma Îranê ye ku bi gumanbariyeke mezin û nêrîneke ewlekarî li her serkeftin, pêşketin û rêxistinbûyineke Kurdan dinêre. Ji bo desthilatdarên Tehranê, Herêma Kurdistanê ya bi hêz, dêmokratîk û aram, kêşeyeke bingehîn û hêleke sor a ewlehiyê tê hesibandin. Sedem jî ev e ku ev modêla serketî ya desthilatdariya li ser bingeha vîna xelkê, rastî dijberiya eşkere ya xwezaya dîktatorî û navendparêz a rêjîma Îranê tê.

Rêjîma Îranê her tim ditirse ku yekbûn, rêxistinbûn û geşepêdana siyasî û çandî ya li Herêma Kurdistanê, bibe mînakek ku waneyê bide milyonan Kurdên li Rojhilatê Kurdistanê. Gelekî ku bi dehsalan e rastî cudakarî, tepisandin, zordariya çandî, bêparbûna aborî û înkarkirina mafên netewî û sivîl ên xwe hatiye. Heger Herêma Kurdistanê bihêz be, pişta Rojhilat jî germ dibe. Li gor nêrîna rêjîma Îranê, her hewldanek ji bo xurtkirina saziyên sivîl, parlamentoyî û serxwebûnê li Başûrê Kurdistanê, egera şiyarbûna zêdetir a hişmendiya xelkê û daxwazên ji bo destnîşankirina çarenûsa xwe li deverên din bi xwe re tîne.

Ji ber vê yekê ye ku rêjîma Îranê hemû hewlên xwe ji bo têkdan, sepandina zextên siyasî, çêkirina bêewlehiyê, gefên leşkerî û şerê derûnî li dijî Herêma Kurdistanê bi kar tîne. Tehran dixwaze hertim di riya pêkanîna aloziyan de û bi hewldan ji bo qelskirina saziyên qanûnî yên Kurdistanê, rê li ber pêşketina Kurdistanê û geşedana dêmokrasiyê bigire. Her ku Herêma Kurdistanê bi piştevaniya xelkê xwe û piştgiriyên cîhanî gavên bi hêztir ber bi aramî û dêmokrasiyê ve diavêje, tirs û hêrsa rêjîma Îranê jî zêdetir dibe.

Dîroka hevçerx a Rojhilata Navîn şahidiyê dide ku neteweya Kurd tevî hemû êş, tepisandin, zordarî û hewldanên rêjîmên dîktator ji bo jinavbirina nasnameya wan, hertim li ser riya azadî û pêşketinê bûye. Pêşwaziya dîplomatîk a cîhanê ji bo tevgerên parlamentoya Herêma Kurdistanê û piştgiriyên eşkere yên Washingtonê, nîşan dide ku ev herêm êdî ne diyardeyeke demkî ye, belku rastiyeke ku nayê înkarkirin û faktorek ji bo aramiyê li navçeyê ye.

Heger Kurd hevgirtî bin, rêjîma Îranê bi berdewamkirina siyasetên xwe yên dujminkarane, ewlekarî û dijberiya li hemberî rêxistinbûna Kurdan, nikare ti tiştekê bike. Ew jî vîna neteweya Kurd e.

Kawe Ahengerî: Entêgrasyon bê garantiyên mafên neteweyî, teslîmbûna li hember serweriya hêza desthilatdar e, Alternatîva Kurdan, tenê û tenê têkoşîna ji bo gihîştina mafên wan yên rewa û bingehîn e, ne tiştekî din.



Hevpevîn.Kawe Ahengerî

Hevpeyvînkar. Sîmîn Rûhanîzade

Di wan dawiyane de, têgeha «Entêgrasyon» wekî yek ji rêkarên çareserkirina pirsa Kurdan di nav sîstema siyasî ya Îranê de tê baskirin. Lê gelo tevlîbûna di avahiya siyasî ya heyî de, bêyî garantiyên mafên neteweyî û beşdariya rastîn di desthilatê de, dikare bibe rêyek ji bo bidestxistina mafên Kurdan, yan jî amrazeke ji bo sînordarkirina daxwazên neteweyî?

Di vê hevpeyvînê de, Kawe Ahengerî Şirovekarê Siyasî, bi nirxandina bingehên siyasî yên entêgrasyonê, ezmûna Kurdan li Îran, Tirkiye, Sûriye û Herêma Kurdistanê, û sênaryoyên pêşeroja siyasî ya Îranê, li ser alternatîvên tevgera siyasî ya Kurdistanê disekine. Ew herwisa girîngiya parastina serbixwebûna siyasî, yekîtiya navxweyî û garantiyên hiqûqî ji bo mafên neteweyî wek bingehên her çareseriyeke siyasî destnîşan dike.

Hevpeyvînkar: Sîmîn Rûhanîzade

-Gelo entêgrasyona Kurdan di nav sîstima navendî ya Komara Îslamî de, bêyî garantiya mafên neteweyî û ji nû ve dabeşkirina desthilatê, rêyek e ji bo beşdariya wekhev, yan projeyek e ji bo kontrolkirin û sînordarkirina tevgereke neteweyî? Gelo neteweyek ku bi dehan salin ji bo mafên xwe têkoşînê dikin, divê pirsa xwe ya neteweyî bi beşdarbûna di sîstima heyî de kêm bikin?

Kawe Ahengerî: Bi nêrîna min, we pirsa wisa pêşkêş kiriye ku em bi lez bikevin nava kûrahiya mijarê. Di sîstima siyasî ya weke Komara Îslamî de, ku sîstimek îdeolojîk a dawîzemanî ye û 48 sal in siyaseta xweyî û nexweyî peyrev dike, heta bazneya kesên xweyî yên nav Komara Îslamî jî sal bi sal biçûktir û tengtir bûye, di vê rewşê de bingeha entêgrasyonê dikare çi wateyekê hebe?

Xala girîngtir di vê mijarê de cureya entêgrasyonê ye. Armanc kîjan cureya entêgrasyonê ye? Siyasî? Çandî û nasnameyî? An jî zimanî?

Bersiv pir hêsan e: Ji ber ku sîstima siyasî ya serdest li Îranê sîstimek hîrarşîk e û nedemokratîk e û di bingehê de jî guhertin û pêşketin, heta reformên dêmokratîk, pêk nayên; lewma her cure tekez kirin li ser têgeha entêgrasyonê, di rastiyê de, teslîmbûn û qebûlkirina serweriya hêza serdest e di warên siyasî, çandî û nasnameyî de, ne tiştekî din.

Pirsa we ya dawiyê jî tam nîşanî vê mijarê ye. Ji ber nebûna mekanîzm û şiyana dêmokratîk di sîstima siyasî ya serdest li Îranê de, ji bo çareserkirina pirsgirêk û krîzên gelek alî, beşdariya tevgerên wekhevîxwaz û azadîxwaz di sîstimek wiha de, bê wata û bê bingeh e.

-Bi avirdan û nêrîn li ser ezmûna Kurdan li Îran, Tirkiye, Sûriye û Herêma Kurdistanê, em dikarin çi dersek stratejîk werbigirîn? Gelo bêyî parastina serbixwebûna biryardayînê û hêza danûstandinê, egera vê yekê heye ku destkevtên tevgereke neteweyî di danûstandinên siyasî de bibin qurbanî?

Kawe Ahengerî: Di rastî de, ezmûna Tirkiyê baş ji bo me eşkere dike ku karesateke bi navê entêgrasyonê çi ye. Entêgrasyona ku tê nîqaşkirin, bi rastiya dîrokî û nasnameya Kurdistanê re tu hevahengiyekê nîne. Ev di demekê de ye ku entêgrasyona rastîn li ser çend bingehan ava dibe:

Wekheviya hiqûqî: Ti girûpek nikare ji ber ziman, netewe an nasnameya xwe ya neteweyî bibine xwediyê mafên kêmtir.

Beşdariya siyasî: Divê hemû kom xwedî derfetên wekhev bin û di biryardayîn û desthilata siyasî de beşdar bibin.

Qebûlkirina ciyawaziyan: Divê ciyawaziyên zimanî, çandî û nasnameyî bên naskirin û pejirandin.

Hebûna saziyên hevbeş: Divê komên cuda bikaribin di çarçoveya saziyên ku ji aliyê hemûyan ve tên qebûlkirin de, li ser mijarên hevpar biryarê bidin.

Hesta xwedî bûnê ya hevbeş: Divê her tak xwe wek endamên wekhev yên civaka siyasî bibînin, ne wek komên xwedî astên cuda yên xwedî bûnê.

Niha, bi van pîvanan, kîjan ji wan di plana entêgrasyonê ya li Kurdistanê (Tirkiyê) de hatiye qebûlkirin?

Li Sûriyê jî, ji ber hêjmoniya deselata îdeolojîk, xuya ye ku heman rêya Tirkiyê tê meşandin. Lê li Kurdistana Îraqê rewş bi tevahî cuda ye. Ji bilî Şengalê, ku di bin kontrola komên girêdayî bi PKKê de ye û ew herêm radestî artêşa Îraqê kirine, beşên di bin kontrola Hikûmeta Herêma Kurdistanê de ye, û rewşa wan gelek baştir e.

-Ger Komara Îslamî lawaz bibe an hilweşe, hêzên siyasî yên Kurd divê bi çi bernameyê bikevin nav hevkêşeyên siyasî yên pêşerojê? gelo divê di destpêkê de beşdarî di avahiya siyasî ya nû de bibe, yan jî berî her peyman û lihevhatinekê, mafên neteweyî û pêgeha siyasî ya Kurdistanê dive bên misogerkirin?

Kawe Ahengerî: Di her du rewşan de, bi nêrîna min, hewce ye ku Kurd wek neteweyek û Kurdistanê jî wek yekeyek û xakeke dîrokî, bikevin nav hevkêşeyên siyasî yên pêşerojê.

Pêşniyara entêgrasyonê berî pejirandina destûra bingehîn a nû, di rewşa hilweşîna Komara Îslamî an jî guhertineke bingehîn di avahiya wê de (bi ferzeke mehal), şaşiyeke gelek mezin e.

Ji ber ku di her du rewşan de, divê Kurd û Kurdistan di destûra bingehîn de wek şirîk û yek ji stûnên sereke yên avahiya siyasî ya pêşerojê ya Îranê bên nîşandan. Herwisa, divê di yasaya bingehîn a nû de cihêrengiya neteweyî û pirrengiya nasnameyî ya Îranê bi awayekî fermî bêne naskirin û avahiya dewletê li ser bingeha wekheviya mafan û beşdariya bi rêjeyekê (parvekirina beşê) di desthilatdariyê de bên avakirin.

Bi gotineke din, em hîn jî xwedî destûreke bingehîn a demokratîk, hemûgir û berfireh nînin. Ji ber vê yekê, pêşkêşkirina mijara entêgrasyonê di nav qanûneke nedemokratîk an jî qanûneke nenivîsandî de, zêdetir dikare wekî derfetxwastina girûp û cinahekê bê nirxandin, ne wekî hewlek ji bo bidestxistina mafên neteweyî û nasnameyî yên neteweyên di nav Îranê de, an jî mafên civaka jinan, şûnketiyên olî û….

-Bi berçavgirtina guhertina siyaseta Amerîkayê û hêzên din yên herêmê, tevgera siyasî ya Kurdistanê çawa dikare ji derfetên navneteweyî mifahê werbigire, bêyî ku bibe amûra pêşbaziya hêzan? gelo bêyî piştgirêdan bi hêza xwe ya rêxistinkirî û îradeya serbixwe, tu garantiyeke derve ya domdar heye?

Kawe Ahengerî: Berî her tiştî, hewce ye bê gotin ku tevgera siyasî ya Kurdistanê berî damezrandina dewlet neteweyên herêmê û hatina Amerîkayê bo herêmê jî hebûye. Lê rastî ev e ku îro Amerîka akterê siyasî yê serdest di qada siyasî de ye. Ev nayê wê wateyê ku em xwe bavêjin hembêza Amerîkayê. Lê ji ber ku Kurdistan xwedî tevgereke azadîxwaz û demokrasîxwaz e, dikare di gelek mijaran de, bi pêkhate û hêzên demokrasîxwaz yên herêmî û cîhanî, bi taybetî Amerîkayê re, li ser projeyên hevbeş yên berjewendiyê bifikire û di vê çarçoveyê de wek akterek rolê xwe bilîze.

Lê divê vê prensîba hêja û bingehîn a Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê, ku ew jî serbixweyiya siyasî ye, biparêze û wê ji bo berjewendiyên ti hêzeke din feda neke.

Di heman demê de, Amerîka û hêzên din yên ku di çarenûsa siyasî ya Rojhilata Navîn de destê wan heye jî hewcedarî bi hevkariya tevgera siyasî û demokratîk a Kurdistanê hene. Ev yek dikare wekî derfeteke girîng ji bo partî û rêxistinên siyasî û tevgera civakî ya Kurdistanê bê nirxandin.

-Eger entêgrasyon wateya tevlîbûn di nava avahiyeke siyasî be ku mafên neteweyî yên Kurdan garantî nake, alternatîva wê ya siyasî û pratîk çi ye? Hêzên siyasî yên Kurd çawa divê di navbera yekîtiya navxweyî, parastina serbixweyiya siyasî û bidestxistina garantiyên hewce ji bo pêşeroja Kurdistanê de pêwendiyekê ava bikin?

Kawe Ahengerî: Heke em li felsefe, hewcehî û sedemên hebûna tevgerên siyasî û dîroka têkoşîna Kurdistanê binêrin, dê baş ji bo me eşkere bibe ku hemû ew barê giran û hemû ew biha yên ku li ser Kurd û Kurdistanê hatiye sepandin, encama hebûna saxtarek nedemokratîk bûye. Ji ber vê yekê, li gorî baweriya min, alternatîva Kurdan di rewşeke wiha de, tenê û tenê têkoşîna ji bo gihîştina mafên wan yên rewa û bingehîn e, ne tiştekî din.

Niha ku rewşa siyasî ya Rojhilata Navîn di nava şer û aloziyê de ye, divê Kurd, di heman demê de ku tekezê li ser yekîtiya neteweyî û parastina serxwebûna siyasî dikin, bi hişmendiya siyasî, li pey derfetan bin. Ya ku ji bo min eşkere ye, ev e ku di nav krîzan de derfetên zêrîn û bêhempa hene ku dikarin berjewendiya Kurdan misoger bikin. Lê ya ku hewceye ye, helwesteke hewce ya li hemberî wan rewşan û xwedîderketin ji hebûn û şiyana xwe ye .

Spas ji bo Rêzdar Kawe Ahengerî

Rojilatê kurdistanê layîqê rêz û qîmetê ye



N. Nûrî Aldur



Armanca minî sereke bo vê nivîsê, li ser çend gotinên serokê herêma me yî Kurdistan rêzdar kek Nêçîrvan Barzanî ye. Ez wan gotinan, ji rexnê bêhtir wek hûcûm dibînim.

Gelek ji me baş dizanin ku serokatîya hikûmeta Herêma Kurdistanê û ne xasim rêzdar Nêçîrvan Barzanî Serokê Herêma Kurdistanê di dîplomasiyê de jêhatî û zîrekin û ez bixwe jî vî karî, vê xizmetê pir hêja dibînim û pêjî serbilindim. Firaza wan encamên wan dîyarin; wek nîşan û îspata van noktên li jor, ezê xwarê bo we xwendevanan şirove û pêşkêş bikim: kar û tekoşîna wan li gel Baxda û Şamê, her çiqas bi teq û req, xir û cir jî be - di gelek noktande bi ser di kevin.

Dîplomasî wehaye; bide û bistêne, bi sed hezaran kurdên me yî ji Rojava li herêma Kurdistanê de bi cih bûne û Erabên Îraqî jî hatine Herêma Kurdistanê û eve hemî kar û politîka aqilana li gel Baxdayê û Şamê pêwîst dike û serokatîya Kurdistanê vê jî baş bikartîne.

Têkilîyên hikûmeta me, li gel welatên din yên Erab(Qatar, Umman, Ordon û hinekên din) ez bawerim di meseleyên ticaretê de gelek başin.

Dîplomatîya li gel Ankara, ji xwe di sewîyeke aktûel û bilind deye. Wa dîyare ku Ankara gûh dide bawerî û daxwazîyên serokatîya(nokta herî gring ticarete, lê belê ne tenê ewe) herêma Kurdistanê.

Ê ka em bizanin li gel Tehranê rewş çawa ye? Ha ji xwe li vir mesele hesas dibe û ez bi xwe nizanim bê ma gelo bersiv wê çawabe û wê çilobe! Ji ber ku rejîma Tehran xwedî îdareyeke reş û tarî ye (hemî demê jî her wisa bûye) protokol, hevdîtin û guft û go ne dîyarin/ ne eşkerene.

Helbet hingî jî, ji rejîmên wisan merov nikare ti hêvîyên din bike. Ha li vir, serokê Kurdistanê rêzdar Nêçîrvan Barzanî pêwîst bû li gor hizr û bawerîyên min, ku li hemberî kurdên Rojhelatê Kurdistanê piçek xwedî sempatî bana, hinek dilşewat bana, anjî bêhtir dîplomat bana.

Ma gelo, ne-neheqîye dema ku rêzdar serokê Herêmê, Rojhelatîyan biçûk û perîşan bike? Raste, ewan li herêma Kurdistanin û bê goman eve bo hikûmeta kurdî ne hêsan e, lê belê ewan di dema Sedam Husêyn de jî li wan deran bûn, û ji xwe rejîma melayan herdem kamp û malên Rojhelatîyan bombebaran dike, pêşmerge û kesên wan şehîd dike û eve zararê dide başûrîyan jî û eve dîplomasiya hikûmeta kurdî jî lawaz dike. Divêt em vê jî baş bizanin ku rejîma melan, opozîsyonan qet qabûl nakê, tehemûl nake û di dawîya dawî de, ew desthilata hikûmeta kurdî li başûrê Kurdistanê jî qabûl nekin.

Hûn kurdên başûr rêjîma Îranê û desthilatdarên wê ji me hemiyan baştir dinasin(anjî pêwîste ku hûn wana ji me bêhtir binasin) ji ber ku hûn gelek salan li wir penaber mana.

Rojhelatîyan pevre yekbûnek çêkirine û eve tiştekî pîroz e û ewan pevre îlan kirine ku dixwazin û di tekoşina xwe da bê şer meselan çareser bikin, dîplomasiyê bikarbînin, LÊ û dîse jî LÊ; divêt ku em û hikûmeta kurdî bi bîrbînin; ku dîplomasî li gel terorîstan nabe.



Şehîd Qasemlo li gel wan dîplomasî kir, Simkoyê Şikak jî bi wan bawer kir û çû hevdîtinan bi wan re bike, belkî jî şehîd Qazî Mihamed û Şerefkendî jî bi xap û dîplomatsya wanî pîs û lewit î ketne xefka wan.

Ne ku ez şîret û aqil di warên dîplomasiyê de didime kesî; na, na; belkî bi sedan aqilmend û mûşawîrên hikûmeta kurdî hene – LÊ, mafê me yî her welatîyî heye ku di dema ku heqsizî, nebaşî û bê adaletî li gel- û welatê me bibe, divêt em bi bilindî û bi modernî; bo xweşî û serfirazîya kurd û Kurdistan bikne qîr qîr: îro ji hemî rojan bêhtir pêwîstîya Rojhelatîyan bi empatî û sempatîya me heye; bîlhesa bi arîkarîya başûrîyan, bi arîkarîya hikûmeta kurdî, hikûmeta Kurdistan.

Mîna ewan çawa arîkarîya Rojava, Bakûr dikin – divêt bo Rojhelatjî bikin; eger ewe nikaribin, hema Rojhelatîyan ne perçiqênin jî.

Ev ne cara yekeme ku dilên Rojhelatîyan têt şikandin, berî bi demekê pêşmergeyeke jin ku rejîma melan şehîd kiribû li başûr, nexweşxanan derîyên xwe girtibûn û heta jî mizgeft û goristanan jî eve cenaze qabûl nekiribûn. Eve ne layiqê kurd û kurdewarîyê ye, birêzan berpirsîyaran û serokatîya başûrî welatê min.

Tirsa Şerê Nukleerî: Sîbereke giran li ser Jiyana Ciwanan



N. Sefiye Xalidî



Di nav aloziyên siyasî û leşkerî yên ku her ku diçe zêdetir dibin de, yek ji fikarên herî kûr ên xelkê Îranê, îhtîmala şer e; şerek ku dibe çekên nukleerî jî tê de bên bikaranîn. Nûçeyên rojane û parvekirinên li ser medyaya civakî yên derbarê êrîşên leşkerî, zêdebûna aloziyan û amadekariyên ji bo rewşên awarte, atmosfereke nediyariyê û tirsê afirandine. Her çend hêj ti pevçûnek dest pê nekiribe jî, gelek kes hîs dikin ku karesatek li ber derî ye.

Lê belê, yek ji encamên vê rewşê ku herî kêm behsa wê tê kirin, ew e ku şer dikare aştiya derûnî ya mirovan wêran bike, hêj gelek berî ku mal û bajarên wan wêran bike. Carinan, civakek dest bi dayîna berdêla derûnî ya şer dike, hêj gelek berî ku pevçûneke leşkerî bi rastî dest pê bike. Mirov li malên xwe dimînin, karên xwe yên rojane dikin, zarokên xwe dişînin dibistanê û ji bo paşerojê planan çêdikin. Lê hişê wan êdî di dema niha de najî. Berevajî vê, ew di bin bandora ramanên derbarê paşerojekê de ne ku dibe bi xwe re teqîn, wêranî, koçberî, veqetîn û windahiyan bîne.

Ji perspektîfa psîkolojîk ve, yek ji encamên herî girîng ên vê rewşê, “fikara pêşwext” e; rewşek ku tê de mirov bi berdewamî gefeke pêkan xeyal dikin û di hişê xwe de dubare dikin. Dibe ku ew ji xwe bipirsin: eger şer derkeve dê çi biqewime? Eger malên wan bên wêrankirin, ew ê biçin ku derê? Eger kesên ku jê hez dikin winda bikin, ew ê çawa bijîn? An jî, gelo dê derfeteke wan çêbibe ku wê pêşeroja ku xeyal dikirin bibînin? Gava ku ev pirs her roj bi nûçeyên tirsînok tên xurtkirin, dibe ku veguherin çerxeke fikarê ku derketina jê her ku diçe zehmettir dibe.

Medyaya civakî û dezgehên nûçeyan di avakirina vê atmosferê de roleke girîng dileyizin. Raportên piştrastnekirî, pêşbînî û dîmenên dilhejîner dikarin bi lez belav bibin; ev yek jî dibe sedem ku gef, li gorî delîlên heyî, bêtir nêzîk û piştrasttir xuya bikin. Agahdarbûn girîng e, lê divê ragihandina berpirsiyar, li şûna ku bibe sedema panîka giştî, agahiyên rast pêşkêş bike.

Yek ji aliyên herî hesas ên vê krîza derûnî, bandora wê ya li ser zarokan e. Zarok hêj di pêvajoya pêşxistina têgihiştina xwe ya derbarê cîhanê de ne. Ew li malbatên xwe û mezinên derdora xwe dinêrin da ku diyar bikin ka cîhan cihekî ewle ye an na. Ji bo zarokekî, divê mal bibe sembola ewlehiyê, divê dêûbav parastina hestyarî dabîn bikin, û divê paşeroj bibe qada lîstik, fêrbûn û mezinbûnê. Lê gava zarok dubare dibihîzin ku dibe şer derkeve, bajar bên wêrankirin, an jî mirov neçar bimînin ku malên xwe terk bikin, hesta wan a ewlehiyê dikare bi awayekî kûr bikeve bin bandorê.

Carinan zarok pirsên wisa dipirsin ku bihîstina wan dilê dayîk û bavan diêşîne: “Heke şer çêbibe, gelo em ê bimirin?” “Gelo mala me wê wêran bibe?” “Heke dayik û bavê min li vir nebin, kî dê li min binêre?” Ev pirs ne tenê nîşaneya meraqê ne; ew hewcedariya kûr a zarokekî ya ji bo ewlehî, evîn û dilniyabûnê nîşan didin.

Pêwîstiya zarokan bi ravekirinên siyasî yên tevlihev tune ye. Pêwîst e ew bizanibin ku ew ne bi tenê ne, kesek li wan dinêre û ew dikarin behsa tirsên xwe bikin. Divê dêûbav rewşê bi zimanekî ku li gorî temenê zarok e rave bikin, bêyî ku wan bi hûrgiliyên tirsnak an wêneyên acizker re rûbirû bikin. Divê xetereyên rastîn neyên înkarkirin, lê divê mezin nehêlin ku tirsên wan bi xwe, cîhana hestyarî ya zarokên wan dagir bikin.

Ciwan jî bi kûrahî bandor dibin. Di qonaxekê de ku divê ew perwerde, kariyer, têkilî û paşeroja xwe ava bikin, gefa berdewam a şer dikare bibe sedem ku planên wan nezelal an bêwate xuya bikin. Dibe ku ew ji xwe bipirsin: “Çima ez bixwînim an bixebitim, dema ku her tişt dikare di şevekê de biguhere?” Ev rewş dikare bibe sedema bêhêvîtiyê, kêmbûna motîvasyonê û hesta ku divê jiyan rawestiyayî bimîne. Ji bo hinek kesan, koçkirin ne tenê vebijarkeke aborî an perwerdeyî ye, lê di heman demê de hewldanek e ji bo dûrketina ji nezelaliyê û ji nû ve bidestxistina hesta ewlehiyê.

Encam ji asta kesan wêdetir diçin. Divê hikûmet û rêberên siyasî fêm bikin ku gefên leşkerî bandorê li rewşa derûnî ya civakan bi giştî dikin. Mafê mirovan heye ku bizanin ka çi hatiye piştrastkirin, çi tenê texmîn e, û sivîl dê çawa bên parastin. Her wiha, berpirsiyariya medyayê jî ew e ku agahiyan bi awayekî rast ragihîne û ji belavkirina tirs û panîka nehewce dûr bisekine. Azadiya agahdarkirinê divê ligel berpirsiyariya exlaqî be.

Tirs ji şer, bertekeke mirovî ya xwezayî ye, ne nîşana qelsiyê ye. Lêbelê, gava ev fikar dibe rewşeke berdewam û jiyana rojane têk dide, dikare bandoreke cidî li ser tenduristiya derûnî bike. Ji ber vê yekê, aştiyeke tenê îdealeke siyasî nîne; ew hewcedariyeke bingehîn a mirovan e. Mirov ji bo fêrbûn, xebat, hezkirin û avakirina paşerojekê, pêdiviya wan bi ewlehiyê heye. Nexwe, di rewşên wiha de mirov çawa dikarin tenduristiya xwe ya derûnî biparêzin?

Sînordarkirina rûbirûbûna bi nûçeyên tirsnak, şopandina çavkaniyên pêbawer, û dûrketina ji nûvekirinên domdar ên medyaya civakî dikare bibe alîkar ku fikar kêm bibe. Cûdakirina agahiyên piştrastkirî ji gotegot û pêşbîniyên siyasî jî bi heman rengî girîng e. Amadekariyên awarte yên maqûl dikarin dilniyabûnê peyda bikin, lê divê ew nebin obsesyonek li ser karesatê.

Parastina rûtînên rojane, kirina werzişê, derbaskirina demê bi kesên hezkirî re, berdewamkirina xwendin û kar, û danîna planan ji bo pêşerojê, dikarin alîkariya mirovan bikin ku bi jiyanê re têkildar bimînin. Divê zarok û ciwan bên teşwîqkirin ku tirsên xwe bînin ziman û bersivên aram û rastgo yên ku li gorî temenê wan in, werbigirin. Dema ku fikar û tirs digihîje asteke ku mirov nikare bi ser bikeve an jî astengiyê ji bo çalakiyên rojane çêdike, dibe ku pêwîstî bi piştgiriya psîkolojîk a pispor hebe.

Di dawiyê de, mafê mirovan e ku ne tenê bijîn, lê her wiha bi hêvî û rûmet bijîn. Şer ne tenê avahî û bajaran wêran dike; carinan, gelekî berî teqîna yekem jî, zirarê dide hêvî û xeyalên mirovan. Malbat, civak, hikûmet û medya; hemû berpirsiyar in ku rê li ber wê bigirin ku tirsa karesateke gengaz, jiyana nifşekî tevahî rawestîne.

Em nikarin her tim kontrola sibê di destê xwe de bigirin, lê em dikarin nehêlin ku tirs îro jiyana me ji destê me bigire.

Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

Hêzên ewlehiyên rêjîmê 6 welatiyên din jî li Rojhilatê Kurdistanê binçav kirin



Li wan çend rojên derbasbûyî de pêleke binçavkirinên xoserane û neyasayî ya welatiyên Kurd ji aliyê hêzên hov ên ewlehiya rêjîmê ve li bajarên Bokan û Pîranşarê, dest pê kiriye û zêdetir ji 6 welatiyên kurd bi neyasayî hatine binçavkirin.

Li wan binçavkirinan de “Mamosta Melahesen Mehmûdî, Fetah Hacîzade, Newîd Mistefazade û Aram Wefayî” li Bokanê û “Miradhasil Ebûbekrî û Sadiq Ebûbekrî” li bajarê Pîranşarê de ji aliyê hêzên ewlehiya rêjîmê ve, bê belgeya yasayî hatine girtin û bo cihek nexuya hatine veguhastin.

Pêka raporên belavbûyî “Mamosta Melahesen Mehmûdî”, pêşnivêjê gundê “Kanî Tûmar”ê ye û Fetah Hacîzade” xelkê gundê “Gamêşgulî” û “Newîd Mistefazade” yê temen 21 salî xelkê gundê Daşbendê ye.

Tevî ku ev welatiyên Kurd bi awayê neyasayî hatine binçavkirin, ti zanyariyek li derheq sedema binçavkirin û cihê ragirtina wan li ber dest nîne û ji mafê hebûna parêzer, hevdîtin û pêwendî digel malbatê jî bêpar bûne.

Raporta Yeketiya Pîşeyî a Mamosteyên Kurdistana Îranê



Kurte raportek a Yeketiya Pîşeyî a Mamosteyên Kurdistana Îranê li yek meh û nîva destpêka sala nû a xwendina 1405an bo 1406an a Rojî li Rojhelatê Kurdistan û Îranê.

Piştî mehek û nîvê li destpêka sala nû a xwendina 1405 bo 1406an a Rojî, li piraniya qutabxaneyan li bajarên Kurdistan û Îranê de pirtûkên dersê li piraniya qutabxaneyan nehatine dabeşkirin û qutabî û malbatên qutabiyan neçar in pirtûkên dersê li bazara azad de ku bergek pirtuka dersê li 400 bo 500 Hizar Tumenî li ser şeqaman û pirtukxaneyan de bikrin.

Herwisa li rewşa giranî û çûne ser rojane a bihaya alav û xizmetguzariyan li Kurdistan û Îranê de navina hiquqê mamosteyan li Kurdistan û Îranê de 29 Milyon û 100 Hizar Tumene. Eva di demekê de ye ku hêla hejariyê li Kurdistan û Îrana de ji 85 Milyon Tumen derbas kiriye, li rewşek wiha de eger mamostayeka zanîngehê ya qutabxaneyê bi 25 bo 30 sal pêşîneya mamostatiyê 50 bo 60 Milyon Tumen hiqûq hebe li jêr hêla hejariyê de ye.

Ji aliyek din ve li sala nû a xwendinê de givaş li ser rêkxiravên pîşeyî ên mamosteyan û mamosteyên çalak bi dehan qat ji aliyê navendên ewlehî û herasetê ve zêdetir kirine û heya niha 12 mamoste ji aliyê dadgehên dîwana edaleta îdariya rejîma komara Îslamiya Îranê ve hukmê girtina teizîriya dadweran û yek mamoste jî sizaya îdamê bi ser de hatiye sepandin.
Herwisa li Rojhelatê Kurdistanê 10 mamoste ji aliyê dadgeha rejîma ve bi derkirin, bêparkirin ji wane gotinê û dûrxistinê hatine sizadanê.

Rêjîma Îranê ti rêyeke yasayî bi nîşandana nerizayetiyan nehiştiye




May Sato, Raportêra Taybet a Neteweyên Yekgirtî li karûbarên mafên mirovî li Îranê, got ku sînordarkirin û astengiyên yasayî û tepeserkariyên ewlehiyê ya rêjîma Îranê ti rêyeke yasayî bo nîşandana nerazayetiyê nehiştine.
May Sato tekez kir ku 4 dehikên tepeserkariyan nekariye xwenîşandanan bisekinîne û nerizayetî kûrtir kirine.
Herwisa May Sato, li 3 emîn civîna giştî ya Neteweyên Yekgirtî li New Yorkê de, got ku azadiya gotinê, kombûna aştîxwazane û rêxistin li Îranê de hem li yasa û hem li piraktîkê de bi tundî hatine sînordarkirin.
Raportêra Taybet a Neteweyên Yekgirtî li karûbarên mafên mirovî li Îranê, “Encam ev e ku ti rêyên yasayî bo nîşandana nerizayetiyê nemaye. Vê daxwaz ji berpirsên rêjîma Îranê kir ku nerazîbûna aştiyane wekî beşek ji civakek tendurist bihesibînin û vê wek gef nebînin.

Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (529)



RİYA QUDSÊ

Ne ji Kerbelayê, li ser sifreyên gel de derbas bû

Partiya Demokrat A Kurdistana Îranê - Navenda Ragihandinê